

û bixêrhatina mîvanan ji hêla partiya Yekîti ve û paşê jî :

Gotina Encûmena giştî ya Hevbenda Demokrat a Kurd li Sûriyê, ji hêla mamoste Reşîd Bedran: ve hate pêşkêşkirin , û wergera hin perçeyên bijarte ji gotinê ev e: (...Me bi koçbarkirina mamoste Îsma'îl Omer , xebatkarekî bê hempa ji bo gelê Kurd û welatê Sûriyê wenda kir.... Ew xwedî roleke zor gîring di nav tevgera siyasî ya Kurd û niştîmanî de bû. Bi çûna wî ziyaneke mezin gihaye Tevgera Kurd û niştîmanî li Sûriyê.)

Gotina Encûmena siyasî ya Kurd, ji hêla Dr. Ebdil-hekîm Beşar ve hate pêşkêşkirin., û wergera hin perçeyên bijarte ji gotinê ev e : (... Bi barkirina mamoste Îsma'îl Omer , tevgera me ya Kurd li Sûriyê yek ji berzîtîrîn xebatkar wenda kir.. Di nav hevalên xwe û tevgera Kurd de, roleke erênî dilîst.Xebata wî ji bo çareseriyê demokrat û dadmend ji doza Kurd li Sûriyê re bû.....

Gotina Pariya Pêşverû , ji hêla mamoste Hemîd Hec Derwêş ve hate Pêşkêşkirin. Wergera hin perçeyên neqandî ji gotinê ev e : (....Çûna wî ya zû, ziyana hemî tevgera me ya Kurd û Sûriyê bû.... Birayê me, bavê Şiyar xwedî sinciyên Kurperwer û welatparêz bû, lewre jî di nav tevgera me û ya Sûrî de jî xwedî roleke erênî bû... Di navbera me de têkliyên biratî yên germ hebûn ... Xem û qisaweta me gihana hevkarîyê di navbera basikên Tevgera Kurd de bû , û emê ji bo vê dozê bi birayê xwe yên Yekîti re her berdewam bin)

Gotina Encûmana ragihandina Şamê. Ji hêla birêz Kibraîl Mûşê ve hate pêşkêşkirin, û hin perçeyên wergerandî ji gotinê ev in : (... Herkesê ew di nav tevgera

welatparêz de, ji nêzîk ve dinasî , têdighîşt ku çiqas mirovekî welawparêz dilsoz... bû.....Tevî kar û xebata wî ji bo doza gelê xwe.... Ew ji guhdana bi doza welêt nedima ... çareserkirina doza gelê xwe , di nav çareserkirina doza Sûriyê de didît ...)

Gotina dostên rehmetî ji hêla birêz Zuhêr El-boşî

ve hate pêşkêşkirin, vaye hin perçeyên wergerandî ji gotinê : (...Ez pir dudilî mam , ku serê kê sax bikim, yê kek Mihyedîn Şêx Alî, sekretêrê Yekîti, an hevalên wî, anjî yên beşdarên.Min ji xwe bêtir tu kes nedît , ji ber me dost û hevalekî zîrek wenda kir.... Koçbarkirina mamoste bavê Şiyar ne ziyana partiya Yekîti bû û hew, belê ziyana tevgera Sûriyê tev de bû...)

Gotina Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Xwîşk û birayên hêja...

Nûnerên partî û rêxistinên...

Beşdarên rêzdar...

Hûn tev bi xêr hatin, bila serê we hemiyên sax be.

Îro, roja Sêşemê 19ê meha Tîşrîna yekê sala 2010an, rojê dîrokî ye, ku li gundê QEREQOYÊ we xatir ji mamoste Îsma'îl Umer xwestiye. Ew bi dilekî rihet, bi rûyekî sipî çav damirandin û ji vê dunya ronik ji nav me bar kir.

Xwîşkino, birano...

Mamoste Îsma'îl Umer-Bavê Şiyar- çendî berpîrsiyar û serokê partiya xwe bû, ewqas jî nefis biçûk bû, hevalê hevalê xwe bû, xwe di ser miletê xwe re ne didît, bi herhawî mirovhez bû. Lewre jî, çûna wî ne tenê xisara partiya me bû,

lê belê, xisara tevahiya Tevgera Kurd bû, xisara Kurd û Ereb bû, û xisara Sûriyê bû.

-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Sultan başa-el-etreş, Şêx salih el-elî û Îbrahîm **D.R (3)**